

Xwe peşandana dîrokî li ber dere Parlementoya Ewropa li Brukselê/ Balçîqa

Di roja 09.05.2007 da cara awil (yekemîn) Êzîdî ji bona go mahfê wan yen bingeîn û Ola wan wek hemi Olê din li ser rûyê vê Cihanê (Dinyayê) ji laye dewlete go ew le dijin ben qebulkirin li peytexta Ewropa Brukselê li berderiyê Parlementa Ewropa li hev civiyan.

Li cihê mitîngê gelek kesa peyamê xwe xwendin û çalakvana bihevra ew kesê go ji ber ol û bahweriya xwe heta niha hatina qetilkirin û bi teybetî yen ku di van çend hefetezen bûhirîda li Musil hatibûn qetilkirin, carek din anîn bîra xwe û rêz ji wanra girtin. Kûştina keça (qîza) Êzîdî Dua go bi hovana hatibû kûştin jî anîn bîra xwe û teva nerazîbûna xwe di derbarê vê yekê da anîn ziman û gotin ti girêdana karê wiha bi hovanî bi Ola Edayî ra nina û nayê qebulkirin go hin bixwazin vê yekê bi Ola Ezdayî va giredin.

Teybetiyen vê xwe pêşandanê çibûn?

Merov karê gelek teybetiya bîne ziman lê yen serekê bi raya min evin.

1. awil car bû ku Êzîdiya bi xwe û bê alîkariya kesê ne Êzîdî ev çalakî amade kirin û pek anîn. Helbet ne bê zahmetî. Gelek erîş hatin ser wan û bê hesab jî propaganda li dijî wan bi alîkariya gelek rojnamê û Televizyonê Kurdan da û bahra behtirîn bi karanîna gelek haceten Internetê da (Malper, Paltalk, MSN ... ..) hatin belav kirin. Gelek Êzîdiyan ku di xwestin beşdarî vê çalakiye bibin bi vê yekê çavtirsandî bûn û li mala xwe runiştin û tevî vê bîranîna hemû Fermanê ku li bav û kalê wan rabûna û hejî berdewamin nebun. Mixabin! Mixabin ji wera ku Êrîşker û yen dolaba Propaganda xûrt di gerandin bi xwe Êzîdî bûn û gelek ji wan bi çavekî bilind û nefsek mezin li xwe niherin û be fihêtî bejin: *"em jî rewşenbîrê vê Olê na."*
2. Dîsa herî teybet ewbû ku ji her welatê ku berê Êzîdî le diman (Rusya, Ermenistanê, Gurcistanê, Tikiye, Iraqê û Surye) tevî vê çalakiye bûbun. Ev tiştê herî balkeşbû ku bi saya dijminê vê olê nazik û dîrokî bi sedê sala Bav û kalên me ji hev hatibûn qetandin û tekiliyen wan bi carekê ji hev hatibûn birîn lê dîsa em di mejîyên xweda tim li ba hev bûn, jiber go li her cihê, li her warî, di nava her gelanda û sistemê Siyasî da eş û jana me yekbû û hejî yeka. Gava min ev rastî dî ew gotina Tawisî Melek hat bîra min: *"ti ê minbê tî li Hindê bê tî li ber minî û ti ne e minbê tî li ber min bê dîsa ti li Hindê yi."* Baş hat fahmkirin go ti kes û ti hez nikarin vê rastiye betal bikin.
3. **Birêz Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê** ku bi xwe li parlementoya Ewropa bû peyama xwe ji wanra şand. Wîjî di peyama xweda çalakiya Êzîdiya wek karekî ji bona demokratî û aşîtiyê nirxand û leborîna xwe ji çalakvana xwest ji ber kû karê wî dîplomasi hewqas teng bû û nikarîbû bi şeşê xwe beşdarî çalakiya wan bibê û xêrhatinê bida wan. Di berdewamiya peyama xweda Birêz Barzanî ev mizgîn şandibû ji wanra: *"Ew kesên dibêjin Êzîdî ne kurd in, heqaretê li ola êzdiyan dikin û her weha li Kurdistanê jî dikin, ji ber êzîdî berî her kesî bi netewa xwe, bi ola xwe û zimanê xwe kurd in. Her mirovekî zerarê bigihîne êzdiyan, ew mirov zerarê digihîne netewa Kurdistanê. Bila hemû netew û cihan zanibe, eger Êzîdî ne kurd bin, kurd nîn in. Eger hinek mirovên êzîdî bêjin em ne kurd in, nayê gotinê ku hemû êzîdî ne kurd in."*

Ev payama dîrokî ku heviye xêrê kirin dilê Êzîdiya ji layê keça êzîdî û endama parlamantoya Ewropaya, birêz Feleknas Uça va hat xwendin.  
Bi Feleknas Uça ra birez Cem Özdemir go bi aslê xwe tirka û 2 havalen xwe yen Alman jî beşdarî vê çalakiya dîrokî bûn û wanjî ev çalakî pir gerîng nirxandin û gotin gereka Êzîdî zanibin ew di reya daxwaza qebulkirina mahf û Ola xwe ne bi tenêna û heta ji destê wan bê we piştgiriya wan bikin.

Almanya, 13.05.2007

Ferhun Kurt